Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1166 | 5-Gulan-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | ☎ 423165

## Hunermendên nemir û deng xweş





**Rohat Bulut**

Du hunermendên kurd, Eyaz Zaxoyî û Erdewan Zaxoyî di çand û hunera kurd de cihekî girîng girtine. Eyaz û Erdewan her çend koç kiribin jî bi awazên xwe di dilê kurdan de dijîn.

Em her tim hewl didin kesayetên girîng ên gelê kurd bi bîr bînin. Li vir jî em ê hunermendên navdar Eyez Zaxoyî û Erdewan Zaxoyî bi bîr bînin. Lewre girînge ku mirov kesayetên ji bo doza gelê kurd bi xebat, têkoşîn û hunera xwe berhem efirnadibin ji bîr nekin û nedin jibîrkirin! Em jî wekî pêywir hewildidin ku van kesayetên bi hunera xwe di têkoşîna civaka kurd de cihê xwe girtine û bi jiyana xwe ev bedel dane bi bîr bînin.

Belê ji van hunermendên hêja Eyaz Zaxoyî, bi navê xwe yê din Eyaz Yûsif Ehmed di sala 1961'an de li bajarê Zaxoyê ji dayik dibe. Ji zarokatiya xwe ve ji hunerê hez dike û hemû dema xwe di dîwanên dengbêjan de derbas dike. Eyaz xwendina xwe li Zaxoyê temam dike. Di dema xwendinê de di hin şahiyên xwendevanan de stranan distirê. Piştre serdana Radioya Bexdayê dike û li wir gelek stranan tomar dike.

Herwiha ligel hunermend Erdewan Zaxoyî jî hinek stranan tomar dike. Yekemîn kaseta wî di sala 1982'yan de dertê û bi wê kasetê nav û dengê xwe balav dike. Piştre di salên 1983, 1984 û 1985'an de jî kasetan çêdike. Yanî di jiyana xwe ya hunerî de wî tenê çar kaset çêkirin. Strana wî ya herî naskirî ya 'Newroz hat bi gul û rîhan' e.

Hunermend Eyaz Zaxoyî, stranbêjekî naskirî yê herêma Behdînan e û xebateke berçav di warê muzîka kurdî û kurmancî kir. Hunermend di 25 saliya xwe de, di 20'ê çileya 1986'an de ji aliyê rejîma Beasê bi rêya jehrê tê kuştin.

**Erdewan Zaxoyî**

Hurnermendê din jî Erdewan Zaxoyî, bi navê xwe yê din Erdewan Elî jî di sala 1957'an de li bajarê Zaxoyê ji dayik dibe. Tê gotin ku di nav malbateke xizan de mezin dibe. Ji ber rewşa dijwar a jiyanê wî nekarîbû xwendina xwe temam bike. Di sala 1978'an de yekem kaseta xwe derdixe. Lê hunermend Zaxoyî bi hestên kurdewarî tev diger û dibe pêşmerge. Li gel pêşmergatiyê jî xebatên xwe yên hunerê didomîne. Bêguman dema ku mirov şoreşger be di nav têkoşînê de şert û mercên têkoşînê pêşxistina hunerê jî zehmetir dibe. Di rewşeke wiha de çêkirina kasetan li çiya gelekî zehmet e, lê ew dixwaze hunera xwe pêşbixe û bigihîne gelê kurd.

Ji ber stranên şoreşgerî yên li ser kurd û Kurdistanê rejîma Beasê gelekî aciz dibû. Loma di 26'ê çileya 1986'an de, yanî şeş rojan piştî kuştina Eyaz Zaxoyî, di demeke ku Erdewan li hotêleke bajarê Bexdayê razayî ye, îstixbarata Baasê wî digire, winda dike û (dikuje). Belê hunermend Zaxoyî gelek stranên şoreşgerî çêkirin ku heta niha jî ew stran her tên guhdarîkirin.

## Ciwanê teslîm nebûye û têkoşiya; Bangîn Subhî



Bangîn li hember rewş û nexweşiya xwe serî netewand û nehişt ew rewş li pêş behreya wî bibin astengî, lê hewl da bi vîn û hêza xwe ya têkoşînê hêviyên xwe pêk bîne.

Ji ber rewşa xwe ya tenduristî û nexweşiya hestî, Bangîn Subhî rojên xwe li ser kursiyê derbas dike. Lê dîsa jî li hember rewş û zehmetiyan serî netewand û bi îradeyek mezin zehmetî derbas kirin.

Bangîn (21) li Helebê ji dayîk bûye. Bi destpêka krîza Sûriyeyê re berê xwe da Efrînê, li wir li dibistanên Rêveberiya Xweser xwend, lê ji ber êrişên dewleta Tirk a dagirker ên di 2018'an de tevî malbata xwe vegeriya Helebê.

Bangîn, ji ber nebûna madeya kalsyomê di hestiyên wî de ji dayikbûnê ve êşên nexweşiya hestiyan dikişîne. Ew nexweşî ji ber lihevnebûna xwîna dê û bavê wî çêbû.

Xwişka Bangîn jî bi heman nexweşiya Bangîn ketiye. Ruxmî her tim derman jî bi kar tanîn jî, lê nexweşî nehate derbas kirin. Xwişka Bangîn di 35 saliya xwe de ji ber nexweşiyê wefat kir.

Ji ber hezkirina ji kamîreyê re û hewldana wî ya geşkirina behreya xwe Bangîn di 2021'an de, bi alîkariya malbat, hevrê û hin kesên din kamîreyek kirî.

Bangîn li ser mejî û rewşên xwe zor kir ku bi pêş bikeve. Di wênekêşiyê de dest bi kişandina wêneyên hevrê û malbata xwe kir û piştre kamîre weke rêbazeke dabînkirina pêdiviyên xwe û sivikirina bar li bavê xwe bi kar anî.

Bangîn bi rêya internêtê xwe fêrî kamerayê kir. Her wiha li dîmenên çawaniya kişandina wêneyan gerî, da ku xwe bi pêş bixe.

Bangîn got: "Ger min lensên din bi dest xistin ez ê pir kêfxweş bim. Ji ber ku ew ê di pêxistina behreya min de bibe alîkar."

### Sudoku: Bersiv 78

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 9 | 6 | 2 | 4 | 3 | 8 | 1 | 7 |
| 1 | 3 | 2 | 8 | 7 | 9 | 4 | 6 | 5 |
| 8 | 4 | 7 | 5 | 1 | 6 | 9 | 2 | 3 |
| 3 | 5 | 1 | 4 | 6 | 7 | 2 | 9 | 8 |
| 2 | 8 | 4 | 1 | 9 | 5 | 3 | 7 | 6 |
| 7 | 6 | 9 | 3 | 2 | 8 | 5 | 4 | 1 |
| 9 | 7 | 8 | 6 | 5 | 4 | 1 | 3 | 2 |
| 4 | 2 | 5 | 7 | 3 | 1 | 6 | 8 | 9 |
| 6 | 1 | 3 | 9 | 8 | 2 | 7 | 5 | 4 |

### Sudoku:Pirs 79

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 4 | | | | 6 | | 9 |
| | | 8 | 9 | | | | | 1 |
| 5 | | | 8 | 1 | 2 | 3 | | 7 |
| | 3 | | | 2 | 7 | | | |
| | | | | 4 | | | | |
| | | | 6 | 8 | | | 2 | |
| 4 | | 3 | 1 | 7 | 6 | | | 2 |
| 2 | | | | | 5 | 1 | | |
| 9 | | 1 | | | | 4 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Zû ji ser bindeqa xwe çû:**
- Bitir bûye; qure bûye; zordariyê dike.

**LI SER KEDXWARIYÊ**

**Aşvan aş dialîst, yê din ew dialîst:**
- Yek kedê dide, yê din li ser keda wî dijî.

**Av ji Nêrwanê, fayde li Toqyanê:**
- Em dixebitin lê faydeya karê me digihe hinekên din.

**Çavê xwe berdayiyê:**
- Dixwaze li ser keda wî bijî.

**Gur dikuje qijik dixwe:**
- Bi xêra hin din tiştan bi destê xwe dixe; bi xêra hin din mêraniyê dike.

**Hûrê tenûr dada, qehbê pê ve da:**
- Hin kedê didin hin li ser keda wan rûdinin.

**Li ser keda wî rûnişt:**
- Keda wî xwar; yê din kir, wî xwar.

**Meşka min meşka gamêşa, rûnê min para derwêşa:**
- Ji bo kesê dixebite lê berhemê keda wî digihe kesên din tê gotin.

**LI SER GUHERÎN Û NEGUHERÎNÊ**

**Çû gerê hat ji gerê, dîsa kerê berê:**
- Kesên ku pir digerin lê dîsa dev ji tiştên xwe yên xirab bernadin, xwe naguherînin ji bo wan tê gotin.

**Elo ew Elo ye:**
- Weke berê ye.

**Ew hewş e lê ne ew rewş e:**
- Çawa te dîtî niha ne wisa ye; guhertin bi ser de hatiye.

**Heta ew aş be, tuyê jî qeraş bî:**
- Heta guhertinek çênebe, wê rewşa te jî neyê guhertin.

**Ji hêka xwe wisa ye:**
- Hê di zikê diya xwe de wisa bûye; ji zikmakî ye; taybetiyên zikmakî ne.

**Kurmê şîrî heta pîrî:**
- Taybetiyên wî naguherin.


**Sim sim Simeîl e:**
- Weke berê ye; ti guhertin tê de çênebûne; ka berê çawa bû dîsa wisa ye.

**War ew war e lê ne ew bihar e:**
- Rewş hatiye guhertin; xweşiya wê nemaye.

**Xewnên kevin dibîne:**
- Guhertinên bûyîn nabîne; hê li ser fikrê xwe yê berê ye.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Bi têkoşîn û berxwedanê wê Rêber Apo azad bibe



Parêzera Rêber Abdullah Ocalan û endama Komeleya Asrin Razîye Ozturk,destnîşan kir ku, ti mafên asayî yên Rêber Apo nayên bicihanîn û cîhan û sazîyên peywendîdar bê deng dimînin.**R-3**

## 'Armanca Konferansa Ekolojîk pêkanîna paradîgmaya Rêber Apo ye'



Hevserokê Desteya Jîngehê ya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ibrahîm Eleseed diyar kir ku armanc ji lidarxistina yekemîn Konferansa Ekolojîk ew bû ku paradîgmeya ekolojîk ya Rêber Apo ji aliyê akademisyen, profesor û çalakvanên ekolojîk ve bê nirxandin û şîrovekirin.**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1166 | 5-Gulan-2024 | www.ronahi.net/ku/

# DIVÊ HESABÊ KOMKUJIYA DÊRSIMÊ JI DIJMIN WERE XWESTIN

Komkujiya Dêrsimê di dîroka nêz a Kurdistanê de yek ji wan komkujiyan ku tê de bi deh hezaran kurd hatin qetilkirin, sirgûnkirin û asîmîlekirin. Tevî ku bi dehan sal di ser komkujiyê re derbas bûne jî, bandora komkujiyê heta roja me ya îro berdewam e û polîtîkayên qirkirin û asîmîlasyonê yên li dijî gelê kurd jî berdewam e.**R-3**




## 'Zewaca temen biçûk siberoja jinan tarî dike'



Piştî şoreşa Sûriyeyê diyardeya zewicandina zarokan pir zêdebû, nemaze li herêmên ku di bin desthilatdariya DAIŞ`ê de bû ku her tiştên ku bandorên neyinî li ser civakê dike belav dikir, lê piştî rizgarkirina wan herêman ev diyarde kêm bû , lê hîn berdewam e.**R-2**

## Di vê sedsalê de wateya "Romana Gerdûnî" çi ye?



Cîhana edebî ya gerdûnî, di sedsala 16'an de dema wêje wekî qada tekoşînê derketîye holê, hatîye avakirin. Çawa ku bazara neftê û zêran heye, bi demê re bazara edebîyatê jî hêdî hêdî geş bûye. Piştî xebatên wergerê (sedsala 19'an) zêde bûn, sînorê edebiyata cîhanê berfirehtir bû û Parîs di sedsala 19'an de bû paytexta yekem a komara edebî ya cîhanê.**R-7**




## 'Wê azadiya Rêber Apo di kongireyên astên bilind yên cîhanî de were nîqaşkirin'

Endamê Însiyatîfa Sûrî a ji bo azadiya Rêber Apo Zekî Hesen da zanîn ku wê di qonaxa 2'yem ji Pêngava Azadiya Rêber Apo gavên cidî di kongire û civînên astên bilind de ji bo azadiya Rêber Apo were parvekirin.**R-5**



**Xeyala Hevdîtina R.Erdogan a Biden, beravê çû!**
Ahmed Aktaş *R-4*



**Bawerî û Mûzîk**
Sîpan Şînda *R-7*

# ‘Zewaca temenbiçûk siberoja jinan tarî dike’

Piştî şoreşa Sûriyeyê diyardeya zewicandina zarokan pir zêdebû, nemaze li herêmên ku di bin detshilatdariya DAIŞ`ê debû ku her tiştên ku bandorên neyinî li ser civakê dike belav dikir, lê piştî rizgarkirina wan herêman ev diyarde kêm bû , lê hîn berdewam e.

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

Zewicandina zarokan binpêkirineke li tevahî cîhanê belavbû ye, lê di sedsala 20`an de pirs û lêkolîn derbarê vê diyardeyê de derkete pêş. Gelek hikumetên cîhanê êdî ev zewac red kirin û qanûnên mafên zarokan danîn û diyardeya zewicandina zarokan kêm bû, lê li hin dewletan hîn ev diyarde heye. Zewaca zarokan zewaceke ne fermî ye ji bo zarokên ku di bin sala 18`an de ye û hên negihiştiye temenê zewacê.
Derbarê zewaca di temenekê biçûk de Rêvebera Mala Jinê ya kantona Qamişlo Behiya Murad ji rojnameya me re axivî.

**Sedemên belavbûna diyardeya zewicandina zarokan**

Rêvebera Mala Jinê Behiya Murad bal kişand ser sedemên belavbûna diyardeya zewicandina zarokan li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û wiha got: “Piştî şoreşa Sûriyeyê diyardeya zewicandina zarokan zêdetir



bû, ji ber rewşa penaberiya bi zorê, şert û mercên zehmet di encama şerê rûdayî de, her wiha dagirkirina hin herêman ji hêla DAIŞ’ê ve ku şênî ji tirsa revandina keçan ji hêla rêxistinê ve ew di temenekî biçûk de dizewicandin, yek ji sedeman jî xizanî ye ku malbat keçên xwe dizewicînin da ku barên wan sivik bibe nemaze kêmbûna hişyarbûna civakî rê li ber vê yekê zêde kir”.

**Bi avabûna Mala Jinê rê li ber zêdebûna vê diyardeyê girt**

Behiya Murad wiha domand: “Ji ber zêdebûna pirsgirêkên têkildarî jinan, hewildanên çareserkirina van pirsgirêkan, parastina mafên jinan û wekheviya jin û mêr misoger bike, Mala Jinê di sala 2012`an de hate avakirin û qanûna jinê hat raghandin. Bi vekirina mala jinê gelek rewşên zewicandina zarokan hat sekinandin û heta astekê rê li ber vê diyardeyê hat girtin”.

**Derencamên zewaca di temenê biçûk de**

Behiya Murad bal kişand ser encamên neyinî yên vê diyardeyê: “ Zewicandiana di temenê biçûk de bandorê li ser tenduristiya jinên ku di temenê biçûk de zewicîn ji aliyê fîzîkî û derûnî û hwd.. dike”.
“Ji hêla xwendinê: Ji mafê xwendinê bêpar dimîne êdî nizane çawa bi derdora xwe danûstendinê bike, kesayeta wê ya civakî pêşnakeve, bê xwebawerbûn pê re çêdibe, nezanebûna xwedîkirina zarokan û ji hişyarbûna tenduristiyê dûr dikeve, ev yek gelek xeteriyan bi xwe re tîne”.
“Ji hêla derûnî: Dema ku jin di temenekî biçûk de dizewice berpirsyartiyên mezin hildigre ser milê xwe, ev yek bi awayekî mezin bandorê li ser derûniya jinan dike. Ji ber ne amade ye ku rastiyeke wisa jiyan bike, li vir aloziyeke xemgîniyê dijî”.
“Ji hêla fîzîkî: Di zewicandina jinên di temenê biçûk de gelek nexweşiyan bi xwe re tîne, ji ber ku hîn laşê wê temam nebûye û tehmûl nake ev nexweşî êdî pê re dimîne heta ku mezin dibe û girantir dibe”.
Girêdayî xalên jor Behiya Murad got: “Nemaze ji ber zewicandina di temenê biçûk de rewşên berdanê di civakê de zêde dibin, ev yek bandoreke neyinî li ser civakê bi tevahî dike”.

**Hin çareseriyên rawestandina vê diyaredeyê**

Behiya Murad wiha gotinên xwe berdewam kir: “ Ji bo rê li ber vê diyardeyê bê girtin, li gel pirjinî û tundiya li ser jinê sala 2014`an qanûna jinê hate raghandin da ku kesên van binpêkirinan dikin bên muhasebekirin, heta niha gelek rewşên zewicandina zarokan hatin sekinandin, gelek semîner, çalakî û perwerde hatin dayîn derbarê hişyarkirina vê mijarê de, qanûna jinê hat naskirin. Her wiha di sala 2023`an de navê qanûnê veghurî qanûna malbatê. Wekî din divê rewşa jiyanî ya gel bê başkirin.

**Cezakirina kesên ku zarokan di temenê biçûk de bizewicînin**

Behiya Murad bal kişand ser cezayê kesên ku vê qanûnê pêk neyîne û wiha domand: “ Ji xwe kesên ku zarokan di temenê biçûk de bizewicîne cezayê wê ji salekê heta 3 salan e û xerameta wê jî heye. Li gorî xebata mehekê ya Mala Jinê li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tenê 3 rewşên zewicandina di temenê biçûk de hebû, hin ji wan hatin sekinandin û hin jê hîn li ser xebat tê kirin”.
Di dawî de tevî hebûna gelek sedemên ku dibe alîkar di belavkirina vê diyardeyê de, lê rawestandina wê erkeke li ser milê sazî û rêxistinane û divê li ser vê yekê kar bikin. Dibe ku hikumet qanûnan derxînin ji bo rê li ber vê diyardeyê bigrin, kesên ku van qanûnan binpê bikin pêwîste ku bêne cezakirin.

# Li Reqayê bi hostebûna hunerên destan îlhamê didin jinan

**Julia Abû Zar û Hatîce Al-Mazal ên li Reqayê bi projeyên ku bi hostebûna hunerên destan re çêdikin ji bo gelek jinan dibin îlham, peyam dan ku her gava jinan a biserketî sûd dide refaha civakê.**



Hunerên destan ên ku bi bandora pêşketinên teknolojiyê ber bi windabûnê ve diçin, ji aliyê jinan ve ji nifşekî vediguheze nifşekê din. Julia Abu Zar û Hatîce Al-Mazal ên li bajarê Reqa ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dijîn jî, bi çêkirina berhemên hunerên destan re hem debara xwe dikin û hem jî bi vê hunerê ji bo jinan dibin mînak.

**‘Daxwazên ji bo berhemên me roj bi roj zêde dibe’**

Julia Abû Zar a 40 salî ku ji gelê Ermenî ye, xalîçeyên destan ên ku di temenekî biçûk de bi alîkariya dapîra xwe fêrî bûye, fêrî keça xwe dike. Julia Abû Zar, diyar kir wek jin hewl didin hunerên destan ên ku bi bandora pîşesazîbûnê re bi demê re dest bi windabûnê dike, biparêzin û wiha got: “Ji ber bedewî û hostatiya karê me, daxwaza ji bo berhemên me roj bi roj zêde dibe.”

**Xebatên ku li male çêkir veguherand proje**

Julia Abû Zar, diyar kir ew di karê morîkan de jî hostebûye û wiha got: “Li ser daxwaza xizm, hevjîn û dostan û taxan berhemên xwe li malê çêdikir. Li ser daxwaza zêde ez çûm Navenda Hîlala Zêrîn û xebatên xwe veguherand proj e. Ez beşdarî gelek pêşangeh û çalakiyên cuda bûm. Ez bazinên ku çêdikim, li gorî pîvanên destan dîzayn dikim. Ez ji xeynî bazinan, tesbîh, toqeya por û şalên keziyên bi tayên hirî jî çêdikim. Ez hertim hewl didim rengên ku bi hevdû re xwişkin bînim cem hev. Ji bo karê me pêwîstî bi sebir, afirînerî û baldariyê heye.”

**‘Bi saetên dirêj rûniştin û derzî bikaranîn mirovan diwestîne’**

Julia Abû Zar, gor di civaka Ermenî de zarokên keçan di hunera destan de hoste dibin û wiha got: “Zehmetiyên karê me jî hene. Bi saetên dirêj rûniştin û derzî bikaranîn mirovan diwestîne. Bi demê re zirar dide çav û pişta min. Ji ber vê yekê ez dem bi dem navberên kurt didim. Ez li gorî xizîkên çêdikim rojê ji yekê zêdetir bazinan çêdikim.”Julia Abû Zar, diyar kir ku şert û mercên xirab ên aborî û bilindbûna dolar bandoreke neyînî li buhayên bazarê dike û da zanîn malzemeyên ku ew bikartîne hemû bihabûne.
Julia Abû Zar, da zanîn ji bo ev hûnerên destan tune nebin û derbasê nifşên pêşerojê bibin, divê zêdetir piştgirî bê dayîn û wiha got: “Divê jin di parastina çand û hunerê de rol bigrin. Ez xîret û rûmet im ku dikarim hunerek ku ji dapîra min mîrate maye biparêzim.”

**Dema daxwaz zêde bûn kargeha xwe vekir**

Şêwekara aksesûar Hatîce Al-Mazal jî, diyar kir ew ji zarokatiya xwe ve bi hunerên destan re eleqedar dibe. Hatîce Al-Mazal, diyar kir şêwekariya aksesuarê di destpêkê de li malê dîzayn kir û wiha got: “Min ji bilî siparişên ji bo gelek zêrfiroşan, li ser înternêtê jî firot. Ev nêzîkî sê salan berdewam kir, lê roj bi roj zêdebûna daxwazan re kargeha xwe vekir. Tişta aksesûarên dest ji endustriyên bazirganî yên nûjen cuda dike, bi kalîte, bedewî, balkêş û zerafeta tên hilberandin e.”

**‘Ez bi xêzkirinên çêdikim re wateyên cuda didim qezenç kirin’**

Hatîce Al-Mazal, da zanîn li ser berdaqên sihûn û seramîkan li gorî rengên tê xwestin wêneyan çêdikim û wiha got: “Bi jêhatiya xwe ya xêzkirinê û hunera destan dikim yek, wateyek din didim qezenc kirin. Berhemên hunerî yên ku ez çêdikim ji min re dibe alîkar ku dema xwe ya vala bi xebatên kêrhatî tijî bikim. Her wiha sûd dide civakê jî. Piştî min dikan vekir, karê min hîn baştir bû. Weke jin di jiyana kar de cih girtin, di heman demê de dibe sedema xwebaweriya me zêde bibe. Divê jin heta bigihêjin jêhatîbûna xwe çi li malê çi li derve di pîşeyekê de bixebitin.”

**‘Her gava jinê ya serkeftî kêrî refaha civakê tê’**

Hatîce Al-Mazal, diyar kir bi qursên vekir re îlham dide gelek jinan û wiha got: “Serkeftina projeya min îlham da gelek jinan. Piştî ku jinan projeyên xwe çêkirin, min hewil da zêdetir proje çêbikim. Her gavekî serkeftî ya jin bi tena serê xwe tavêje, sedema pêşketin û refaha civakê ye.” Hatîce Al-Mazal, bal kişand ser hin zehmetiyên karê xwe û wiha got: “Di peydakirina hin malzeme û amûrên ku li herêmê tune, ez zehmetî dijîm. Ji ber vê yekê divê ez ji deverên derdor bikirim. Ev asteng dike ku karê min di dema xwe de biqede. Di heman demê de westandina laş jî heye. Lê piştî qedandina sêwirana her perçeyek, ev westandin vediguhere kêyfê. Bi taybetî ji ber ku min di hunera hunerên destan de şopeke xwe ya cuda hişt, ev yek min motîve dike ku karê xwe bidomînim.”

**‘Divê jin destûr nedin kevneşopiyên kevnar wan sînordar bike’**

Hatîce Al-Mazal, bi bîr xist ku bajarê Reqayê di dema kontrolkirina çeteyên DAIŞ’ê de pêvajoyek tarî jiyan kir û diyar kir ku bi rizgarkirina bajêr re jinan di gelek war û pîşeyan de dest bi xebatê kirin. Hatîce Al-Mazal, destnîşan kir ku jin niha gelek projeyan bi rê ve dibin û peyam da jinan ku divê xwe bi pêş bixin û ji her cure derfetan sûd werbigirin û destûr nedin ku kevneşopî û adetên kevnar wan bi tenê bi mal û malbatê re sînordar neke.” **NÛJINHA**




# Di vê sedsalê de wateya “Romana Gerdûnî” çi ye?

Cîhana edebî ya gerdûnî, di sedsala 16an de dema wêje wekî qada tekoşînê derketîye holê, hatîye avakirin. Çawa ku bazara neftê û zêran heye, bi demê re bazara edebîyatê jî hêdî hêdî geş bûye. Piştî xebatên wergerê (sedsala 19an) zêde bûn, sînorê edebiyata cîhanê berfirehtir bû û Parîs di sedsala 19an de bû paytexta yekem a komara edebî ya cîhanê.

**Navenda Nûçeyan**

Hebûna bazara edebîyata cîhanê êdî ji alîyê her wêjekarî ve tê qebûlkirin. Girêdayî nêrîna serdest, nav û dengê nivîskarî li her derî belav nebûbe yan jî ew ne navekî gerdûnî be, ew mezin nayê hesibandin. Zehfî nivîskarên ji Afrîka, Asya û Amerîkaya Başûr ên ku berhemên wan nagihîjin xwendevanên navneteweyî, xwe serkeftî nahesibînin. Heta nivîskarên welatên bi hêz ên wekî Almanya, Fransa û Îtalyayê gazinên xwe dikin û dibêjin, em gelekî hewl jî didin lê em nikarin weşangeran peyda bikin ku berhemên xwe bi Îngilizî çap bikin. Anegorî van nivîskaran, serneketina wan a gerdûnî, rûmeta wan a li welatê wan kêm dike. Dema pirtûka nivîskarekî îtalî li New Yorkê çap dibe ew nivîskar xwe serfiraz dihesibîne. Di vê sedsalê de mafên romaneke ku hêj li welatê xwe nehatîye çapkirin, bo welatine din jî têne firotin. Dema ku xwendevanekî berhemeke Murakamî hilda destê xwe, dizane ku ew berhem li seranserê cîhanê di heman demê de tê xwendin. Bi kurtasî xwendevan dibe endamê civaka gerdûnî. Ev helwest cazîbeya pirtûkê zêde dike. Ya rast “wêjeya cîhanê” (weltlitaratur) ne têgeheke nû ye. Ev têgeh, ewil ji alîyê Goethe ve hatîye bikaranîn. Goethe di axaftina xwe de gotîye: “helbest milkê hevpar ê mirovahîyê ye. Di roja me ya îro de tu wateyeke wêjeya neteweyî tune ye, serdema me serdema edebîyata cîhanê ye û divê wêjeya cîhanê ji bo vê serdemê bilezîne û bi erka xwe rabe”. (1)
Li gorî Adam Kirsch, “heta ku afateke şaristanîyê neqewime, êdî ne pêkan e ku em di edebîyatê de vegerine ser wê nêrîna berteng a neteweyî”. (2) Kesê ku cara pêşî daxwaza damezrandina Enternasyonala Entelektuelîyê kirîye, nivîskar Valery Larbaud e. Bi nêrîna wî pêwîst bû ku di edebiyatê de sînorên li ser têgihîştina neteweperestîyê ji holê bên rakirin. Edebîyat, nikare wekî giraveke neteweyî ya îzolebûyî xwe (hebûna xwe) mezin bike. Cîhana edebî ya gerdûnî, di sedsala 16an de dema wêje wekî qada tekoşînê derketîye holê, hatîye avakirin. Çawa ku bazara neftê û zêran heye, bi demê re bazara edebîyatê jî hêdî hêdî geş bûye. Piştî xebatên wergerê (sedsala 19an) zêde bûn, sînorê edebiyata cîhanê berfirehtir bû û Parîs di sedsala 19an de bû paytexta yekem a komara edebî ya cîhanê. Di serdema Franco de jî Barcelona ji bo rewşenbîran bû navendeke girîng. Herweha Barcelona ji bo rewşenbîrên şoreşger ên ku ji derbeyên faşîst ên ji Amerîkaya Latîn direvîn jî, bûbû sitargeh. Piştî Parîs û Barcelonayê, di sedsala 20î û 21ê de London û New York jî ji bo edebîyata cîhanê, bûn navendên bi nav û deng. Kesên biryara romana gerdûnî digirtin, elîtên çandî yên li van navendan bûn û wan biryar dida ka romana gerdûnî çi ye û çi nîne.
Demeke dirêj e nîqaşa romana gerdûnî çi ye û çi nîne, tê kirin. Adam Kirsch vê mijara li nav hev ketî pir bi hêsanî wê ji hev vedike û weha pênase dike: “Romanek gava li ser serpêhatiyên mirovên di sedsala 21ê de difikire an jî dest bi vegotina van serpêhatiyan dike, dibe romaneke gerdûnî”. (3) Romannûsê sedsala 21ê divê serpêhatîya lokal li ser paşxaneyeke navneteweyî dramatîze bike. Bi rastî ew jî hinek caran bi serê xwe têra vê yekê nake. Zimanê ku tê bikaranîn, ajansên navneteweyî û pîvanên xelatan, qedera berhemên edebî dîyar dikin. Bi nezera gelek rexnegiran, kesayetên navdar û dewlemend ên cîhanê biryara romana gerdûnî digirin. Serbarî ser, dîsa ew di edebiyatê de derbirîna wan felaketan dîyar dikin ên ku qet bi serê wan nehatine. Taybetmendîyeke din a ku bazara edebiyata cîhanê derdixe pêş, bêguman xelatên navneteweyî ne. Edî ev xelatên navneteweyî nirxê pirtûkekê dîyar dikin. Gelek nivîskarên bi nav û deng, berhemên xwe li gorî hêvî û daxwazên van bazaran û xelatan dinivîsin. Tim Parks, di vê mijarê de minakên balkêş pêşkêşî me dike: “Nivîskarên nûjen ên wekî Per Peterson, Gerbrand Baker, Alessandro Baricco, Kazuo Ishiguro, romanên ku tu agahiyên balkêş pêşkêş nakin, hêsan têne xwendin. Kazuo Ishiguroyî di hevpeyvînekê de dibêje, ez bo xwendevanên navneteweyî zimanekî ji metaforan, ji peyvên netewî hatîye şûştin, bi kar tînim. Hin nivîskarên Skandînavî ku ez wan baş nas dikim, ji bo xwendevanên Îngîlîzî ji navên dijwar dûr disekinin, barê wergêran sivik dikin”. (4) Lê dîsa jî ev bazar dev ji vegotinên fantastîk ên cîhana sêyemîn bernade. Gelek nivîskarên ji kolonîyên berê yan jî ji yên ji cîhana duyemîn tên, bo bala cîhana Rojava bikişînin ser xwe, ji neçarî behsa pirsgirêkên welatê xwe dikin. Welat gelek caran bi nostaljîyê tê bi bîr anîn û ew wekî bihuşteke egzotîk tê binavkirin. Axa ku ew berê lê dijîyan dibe nîgaşeke geştîyarîyê. Pêwendîya mijar û bûyeran bi rastî û dîrokê ve tune ye, jixwe ev meseleyek ne girîng e. Edebîyat, nimandina (index) hestîyarî û empatîyê ye. Tu pirsgirêkek di çarçoveyeke dîrokî û civakî de nayê vekolandin. Pirsgirêkên dîrokî yên wekî şer, komkujî, koçberî û zayendperestîyê mîna ku tenê pirsgirêkên dewletên paşverû yan jî yên totalîter bin, tên dîtin. Nasnameyên têne çewisandin, li gorî nêrîna oryantalîst têne pê, yan na pirsgirêka sereke ne hîyerarşî û newekhevîya di navbera nasnameyên cîhanê de ye. Mirov dikare bi saya serê “romana gerdûnî”, derheqê zulmê de bi agahîyan bihese, lêbelê piranîya sedemên bûyeran dîyar nîn in. Di wê de herkes û hertişt bi awayekî helal-zelal dixuye, lê her tişt di cihê xwe de dimîne û ew ji bo guhertinê û rizgarîyê rêyekê nîşanî xwendevanên xwe nade.
Feqet avantaja siyasî ya edebîyatê ev e, ew dikare hinek tiştan betal bike û xeyala hinek tiştan bi mirovî re çêbike, zorê bidîyê û hejê bi hinek tiştan bixe. Bêguman di edebîyata cîhanê de demareke cuda û



şoreşger jî hebû/heye, bi zimanê dagirkeran (îspanî, portekîzî, fransî, îngîlîzî) hatibû nivîsîn lêbelê ev edebîyat berdevkê bindestan bû, wê hewl dida ku dîroka kolonyalîzmê ragihîne cîhanê. Bi saya zimanên kolonyal ên gerdûnî ew jî tevî “Komara Edebiyata Cîhanê” bûn. Bi qewlê Salman Rushdie, “dema dagirkerên çermê wan pembe vegerîyane welatê xwe, wan li pey xwe; parlamentoyên xwe, dibistanên xwe, rêyên xwe yên fireh û zimanê xwe hiştin”. Ew zimanê wan, gelek caran mîna çekekê li dijî desthilatdarên cîhanê hate bikaranîn. Berhemên vê kevneşopîya edebî, ji romana gerdûnî ya îroyîn pir cuda ye. Derbarê ya gelemperî de nîn e, berovajî wê ew ji serpêhatiyeke dewlemend pêk tê. Mekan ne cihekî gerdûnî ye, hemû bûyer di jîngehekê de diqewimin. Taybetmendîya herî girîng, têkiliyên civakî û aborî, rêça jîyana takekesî diyar dikin. Di van romanan de hêmana herî girîng a ku ji jîyana kesan pêk tê çi ye? Helbet jîyana lokal e. Hebûna ji dîrokê, aborîyê û sîyasetê bandor negirtibe tune ye. Ev edebîyat tenê ji êş û mexdûriyetê pêk nehatîye, wê serhildan û şoreş jî xistîye rojeva cîhanê. Wê têkoşîna kesên ku dixwazin çarenûsa xwe ya takekesî û civakî biguherînin, pir eşkere raxistîye pêş çavan. Wêjeyeke wisa ye ku ruhê her serhildêrekî têkçûyî di her rûpeleke wê de tê hîskirin. Edebîyata Amerîkaya Latîn a Afrîkayê û Hindistanê bi berhemên bi hêz ên vê kevneşopîyê ve têne naskirin. Pascale Casanova, ji bo van romannûsan vê têgînê bikar tîne: “dizên êgir”. Ev dizîya zimên ji bo nivîskarên ku ji zimanê xwe bêpar mane, tê bikaranîn. Li gorî nivîskarê Cezayîrî Jean Amrouche: “Yên ku hatine mêtîngehkirin ne mîratxurên çandeke dewlemend in, ew dizên êgir in” (5) Ji bo ku bikevine nava komara edebiyata cîhanê, wan bi neçarî bi zimanê mêtînkaran nivîsandin. Duzimanî, jixwe encameke pêwîst a diyalektîka kolonyal e. Wan tu caran mîrateya xwe ya çandî înkar nekirin û wan hewl dan zimanê xwe yan jî bi zimanê xwe yê biyanî bigihînin edebîyata cîhanê. Wan efsaneyên xwe yên neteweyî, çîrokên xwe yên gelêrî û vegotinên devkî li romanên xwe yên nûjen reşandin. Ew mafdar bûn, ji bo ku dîrokeke edebî pêk were, pêwîst e mirov di navbera wêje û dîrokê de têkilîyekê dayne û jê biafirîne.
Romannivîsê ku vê serdemê berhemên xwe ne bi îngîlîzî lê bi zimanekî din dinivîse, nikare bala cîhanê bide ser xwe û nikare xwe bigihîjine xwendevanên li seranserê cîhanê. Îro roj kehaneta Goethe pêk hat, lêbelê “serdema edebîyata cîhanê” bi coş û kelecanî nayê pêşwazîkirin. Piranîya rexnegirên wêjeyê, rengvedana zordestîya (hegemony) îngîlîzîyê him di wêjeya cîhanê de him jî di romana gerdûnî de dibînin. Romannûsê Japonî û pisporê wêjeya Fransî Mînae Mizimûra (2015), di pirtûka xwe ya bi navê “The Fall of Language in the Age of English” de dîyar dike ku gelek zimanên wekî latînî, çînî, erebî û fransî di dîrokê de wekî zimanên navneteweyî hatin pejirandin lê îro roj yek ji wan jî bi qasî Îngîlîzî li cîhanê serdest nebû. Ji ber vê yekê êdî gelek nivîskar berhemên xwe ne bi zimanê xwe yê neteweyî, bi îngîlîzî dinivîsin. Xwendevanên gerdûnî, bo mînak dixwazin ku vegotinên hindistanîyan an jî ya Amerîkaya Latîn bi îmgeyên wan re li hev bikin. Gelek romannûsên gerdûnî jî êdî girêdayî wan daxwazan dinivîsin, gelek caran klîşeyên xwe dubare dikin, bi kurt û kurmancî nahêlin xwendevan û cudahîyên rastîn werine rûyê hev. Romanên ku van klîşeyan ducare nakin, ên xwedî derdekî neteweyî û civakî ne, nagihêjine xwendevanên navneteweyî. Dîsa jî berhemên ku mirov dikare wan wekî “romanê gerdûnî” bi nav bike, ji alîyê mijar û şêwazê ve cihêrengîyeke dewlemend nîşan didin. Di vê çarçoveyê de romana Elena Ferranteyê, “Romanên Napolî” bi tena serê xwe mînakeke baş e. Nivîskar di vê rêzeromanê de çirokeke gelek herêmî vedibêje lê di heman demê de ew bandorên gerdûnî yên kapîtalîzmê û nakokîyên sîyasî yên li welatê xwe jî bi serkeftî nîşan dide. Careke din destnîşan dike ku tu rastîyeke herêmî û neteweyî ji dinyayê der nîn e û dinya jî ne cihekî ji wan deran e yan jî serbixwe ye.
Wisa dixuye ku wê di salên pêş de jî li ser romana gerdûnî, nîqaşên xurt/tund çêbibin. Hêvî dikim wêjeya kurdî jî di demeke nêzîk de ji bo zimanên din ên cîhanê were wergerandin û bibe perçeyeke xurt a edebiyata cîhanê.



## Bawerî û Mûzîk

**Sîpan Şînda**

Ji roja bawerî di nava mirovahiyê de derketî û heta niha her tim xwestiye hêza xwe di nav civakê de xurt bike û ji bona vê jî gelek alav bikaranîne. Yek ji van alavan jî mûzîka ku him ji bo baweriyan girîng e û him jî rolekî girîng di jiyana bawermendan de digire.
Bawerî ji du hîman yek ya herî girîng e di nav civakê de. Ji bo gelek kesan hîmê herî girîng jê baweriya wan e û ew bawerî û bawermendiya xwe li ser netew û niştimanperweriya xwe re digirine. Ji ber wê, bawerî ji bo gelek kesan pîroziya wan ya herî mezin e. Lê bawermenda jî, ji bona xwe bi hêztir bikine û bandora baweriya xwe li ser bawermend û civakê zêdetir bikine, gelek caran mûzîk û alavên mûzîkê bikaranîne.
Her çend bi taybetî di nava Îslamê de gelek caran dibêjine stran gotin, yan jî zirne lêdan herame, gunehe jî, lê wan bawermendên ev gotîne jî, stran û alavên mûzîkê ji bona hêzdariya xwe bikaranîne. Him bi awayekî takekesî û him jî bi awayekî komigî. Mînak, dema em zarok bûn mezinan digotin nizanim kîjan şêx û sofiyên xwe diçûn îrşadê û bi erbanê qesîde digotin. Her wiha digotin gelek sofî û bawermend diketin halet. (Halet: peyvekî ku ji bo kesên oldar tê bikaranîn ku dema taet dikine her tiştî ji bîr dikine û bi awayekî giyanî, hişî û dilî xwe teslîmî baweriya xwe dikine. Ango dema yek dikeve halet, mirov dikare bêje ew kes ji ser hişê xwe diçe. Ji ber ku bawerî bandoreke zêde mezin li ser hiş, giyan û dilê wan kesan dike).
Alavên mûzîkê yên ku ji bo hêza baweriyê li ser bawermendan xurt bike têne bikaranîn, çi takekesî bî û çi jî komigî be, cihekî xwe yê giranbuha di jiyana wan bawermendan de heye.
Mînak digotin ji beriya salên 1980 yê bawermend diçûn li ser Sefîna (Sefîne: Cihê ku Keştiya hz Nûh li ser danîye) Çiyayê Cûdî û li wê derê pîrozbahiya olî dikirin. Dibêjin gel û pitirê xwe ji kesên bawermend diçûn wê derê û heftî heftî li wêdê diman û bi hev re li erbanê didan û bi vî hawî diketin halet. Di nav hinek olan de jî bawermend diçine cihê ku ji bo wan pîroze û li cûreyek yê bilûrê didine û bi bandora wê xwe ji vê cîhanê dûrdixine û bi awayekî giyanî û dilî xwe dispêrine baweriya xwe. Di vê derê de jî ew alavên mûzîkê, deng û melodiya wan girêdanekê di navbera bawerî û bawermendan de çêdike ku ew jî bi awayekî giyanî rihet dibîne.
Ya rast di vê derê de, mûzîk ji bo bawermendan xwediyê hêzeke îlahî ye. Ew hêza ku bi dest, hilm û nefesa mûzîkjenî ji alava mûzîkê derdikeve û diçe xwe digihîne dil û giyanê bawermendan hêzeke bê hempaye. Dema gurmgurm û gujîna erbanê yan ji nalîna bilûrê diçe guhê sofiyan/bawermendan, ew rayên dilê û giyanê wan nerm dike û wan ber bi baweriya wan ve dibe. Ji xwe dema qesîdeyek ji bere tê gotin, ew bawermend êdî hema ji ser hişê xwe diçine. Ya rast êdî ew hêza mûzîkê dil û giyanê wan birêve dibe. Ew mûzîk çiqas bi awayekî nazdarî û bandor bête jenîn, wê ewqasî zêdetir bandorê li ser dil û giyanê bawermendan jî bike. Dîsa bi taybetî jî di Dêran de mûzîk weke hîmekî sereke tê bikaranîn.
Bi kurtasî, di nav gelek baweriyan de cihekî mûzîkê yê taybet heye û bandoreke mezin li ser dil û giyanê bawermendan jî dike.

# ‘Armanca Konferansa Ekolojîk pêkanîna paradîgmeya Rêber Apo ye’

**Hevserokê Desteya Jîngehê ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ibrahîm Eleseed diyar kir ku armanc ji lidarxistina yekemîn Konferasa Ekolojîk ew bû ku paradîgmeya ekolojîk ya Rêber Apo ji aliyê ekadimisyan, profîsor û çalakvanên ekolojîk bê nirxandin û şîrovekirin.**

**Ronaz Silêman/Qamişlo**





Desteya Jîngehê ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di 26-27’ê Nîsanê de li bajarê Qamişlo bi dirûşmeya “Bi paradîgmeya ekolojîk bi awayekî fîzîkî Rêber Apo azad bikin û doza Kurd çareser bikin” bi amadebûna 120 kesan konferansek lidar xist. Di roja yekemîn a konfransê de mijarên moderníteya demokratîk de ekolojiya û meşandina têkoşîna ekolojîk li kêleka têkoşîna li dijî mêtingerî û kapîtalîzmê, herwiha di rûniştina roja duyemîn a konferansê de jî mijarê li Kurdistanê têkiliyên di navbera qirkirina komî û qirkirina ekolojîk de û hevkarî di navbera rêxistin û tevgerên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de pêk tê, hatibûn nîqaşkirin herî dawî encamnameya konfransê hatibû eşkerekirin.

Derbarê Konfransa Ekolojîk ya yekem de Hevserokê Desteya Jîngehê ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ibrahîm Eleseed ji rojnameya me re axivî.

Ibrahîm Eleseed diyar kir ku ev cara yekê konfiransa Desteya Jîngehê tê lidarxistin û wiha got: “Konfransa Desteya Jîngehê ji dirûşemya xwe dihat nasîn ku armanca wê ya sereke paradîgmeya ekolojîk ya ku Rêber Apo di paraznameyê xwe de daye destnîşankirin ji aliyê ekadimisyan, profîsor û çalakvanên ekolojîk bên nirxandin û şîrovekirin. Lewra li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê û cîhanî tevlîbûn hatin çêkirin, lê ji ber şert û mercên zehmet ên ku li ser Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê meşandin, bi taybetî êrişên deweta Tirk a dagirker, tevlîbûna beşdarên me yên cîhanî bi riya zoom hatin çêkirin û li gor şert û mercên heyî tevlîbûna sazî, destgeh, tevger û partiyên siyasî ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî hat kirin. Herwiha ev konfrans bi encamnameya hate lidarxitin bibe xaleke bingehîn ji bo guhertina rewşa ekolojîk û kar û xebatên ekolojîk.”

**‘Rêber Apo pirsgirêka ekolojîk şîrove kiriye’**

Hevserokê Desteya Jîngehê ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Ibrahîm Eleseed axaftina xwe wiha qedand: “Di konfransê me yê ku li ser 2 rojan hat lidarxistin me 2 mijarên sereke gertin dest, di roja yekem de mijara sereke ekolojîk di moderníteya demokratîk de ji berxwedanê heta avakirinê, di bin vê xala sereke tevlîbûna akadmisyanên cîhanî hate çêkirin, di heman demê de aloziya ekolojîk û pespektîvên ekolojîk di felsefeyeya moderníteya demokratîk de hatibû xwendin, girêdayî vê mijarê name û semînerên ku ekadimisyanan pêşkêş kirin ew bû ku çawa Rêber Apo karîbû tesbîta pirsgirêka ekolojî li ser rûyê erdê bi taybet li Bakur û Rojhilatê Sûriyê nîşan bide, di heman demê de di roja yekê de nirxandin li ser êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li ser kurdan hatibûn kirin. Di roja duyemîn de jî mijara têkiliyên di navbera qirkirina komî û qirkirina ekolojîk li Kurdistanê, herwiha ne tenê li ser civaka kurd bi 10`ê salan qirkirina ekolojîk hatiye meşandin, lê bi rengekî siyasî û sîstematîk qirkirina ekolojîk li cîhanê tê meşandin.”

Di dawiya konfransê de 7 desteyan nirxandinên xwe yên ekolojîk kirin, ji ber eleqedariya wan di ware ekolojiyê de hebû, mîna Desteya Tenduristiyê, Desteya Aborî, Zanîngeha Rojava, Jinolojî, Akadimiya Jinolojî, Bilatforma Jinên Ekolojîk ya Kongra Star û Kampaniya Rojava, di encam nîqaş û nirxandinên dewlemend yên konfransê encamnameya konfransê hat eşkerekirin û encamname jî wiha ye:

**Rêgez**

1- Zêdeyî 25 sal in li ser Rêberê Gelê Kurd Rêber Abdullah Ocalan tecrîda mutleq a ku tê meşandin, şermezar dike. Herwiha têkoşîna li dijî tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan bingehê têkoşîna exlaqî, antîkolonyalîzmê avabûna civakî ya ekolojîk û demokratîk e.

2- Sîstema kapîtalîst û dewletparêz a îro, ax aniye ber tinebûnê. Krîza avhewayê, şerên enerjiyê, destwerdanên emperyal ên li nîv qada Başûr, xizanî û birçîbûna cîhanê, koçberî û zêdebûna rejîmên totalîter ên rastgir giraniya vê tunebûnê nîşan dide.

3- Mîrata olî, felsefî û rewşenbîrî ya gel û sîstemên baweriyên Mezopotamya û Kurdistanê yên ku ji civaka xwezayî ya ku xwezayê pîroz dibîne û bi xwezayê re têkiliyên domdar û rêzdar saz dike, lewra divê zanist û teknolojiya heyî bi ezmûnên dewlemend ji nû ve were sentezkirin.

4- Li dijî metropolên kanserojen ên moderníteya kapîtalîst, xwerêveberî, eko-bajarên domdar ên bi rêveberiyên xweser re piştgirî dike. Divê li dijî mezinbûna bajaran polîtîka bên dîyarkirin, hilberîn û jiyana li gundan bê xurtkirin.

5- Li ser bingehê paradîgmaya ekolojîk, hemû şerên serdestan û her şêweyên kolonyalîzmê tên redkirin. Dagirkerî û şerê dewleta Tirk li Rojava, Başûr û Bakurê Kurdistanê dibe sedema wêrankirina mayînde û piralî li ser civak û xwezayê.

6- Koçberkirina sîstematîk/paqijkirina etnîkî ya li Efrînê, rûxandina sîstematîk a bi sed hezaran darên zeytûnan, desteserkirina erdan, bê kurdkirina herêmê û wêrankirina tevna wê ya dîrokî, çandî, mînakên ekolojîk û jenosîdê ne.

7- Serdestiya xwezayê ji serdestî û îstîsmara mirovan a li ser mirovan pêk tê, lewra parastina xwezayê avakirina civakeke demokratîk û ekolojîk bingehe. Konferans bi vê armancê armanc dike ku avahiyên îstîsmarê yên li ser bingeha zayend, çîn, etnîkî û olî hilweşîn e.

8- Hebûn û mafên xweparastinê yên hemû zindiyên li çiya, daristan, çem û ekosîstemên girêdayî wan divê ji aliyê qanûnî û siyasî ve bên garantîkirin.

9- Ekolojî îdeolojiyên kolonyalîst, nîjadperest, neteweperest, dîndar, dewletparêz, paşverû/pîşesazparêz, zayendperest weke pîvana bingehîn a civaka exlaqî û polîtîk red dike. Ekolojîk cihêrengiya civakî û cihêrengiya biyolojîkî qebûl dike û piştgirî dike. Ev yek li ser avakirina Paradîgmaya Demokratîk, Ekolojîk û Azadiya Jinê ya ji aliyê Abdullah Ocalan ve hatiye formulekirin.

10- Li dijî êrîşên kapîtalîst û dewletparêz ên li ser xwezayê, weke prensîba bingehîn a temamker, têkoşîna navneteweyî ya antîkapîtalîst esas digire û rêxistinkirina hevgirtin û berxwedana kolektîf dike.

11- Jenosîda sîstematîk, rêzikname û pêkanînên li ser ax, av û daristanên Kurdistanê polîtîkin û amûreke tunekirina Kurdan e. Di vê wateyê de, jenosîd li Kurdistanê ne tenê wekî pêşkeftina netewdewleta klasîk an jî îstîsmarkirina şîrketên kapîtalîst, di heman demê de wekî teknîka qirkirina çandî tê meşandin.

12- Li şûna metropolên kanserojen, hevsengiya bajar û gundan bê vegerandin. Aboriyên herêmên gundewarî yên ku li ser çandiniya xwezayî û ekolojîk ava dibin, bên pêşxistin. Çandinî hêmana bingehîn a civakî-aborî ya Kurdan e, bi taybetî li Rojava. Ji ber vê yekê polîtîkayên ax û avê hêmanên stratejîk ên pêvajoya dekolonîzasyon û rizgarkirinê ne.

**Polîtîka**

13- Li dijî polîtîkayên ekolojîk û ziwabûna ji ber krîza avhewayê “Platforma Ekolojiyê ya Kurdistanê û Roja Cîhanî” bi Komîteya Ekolojiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê re divê sazîbûn û rêxistinbûneke bi bandor bê kirin.

14- Ew tedbîrên li dijî strukturên enerjiyê yên yekdestdar û madenê yên ku tevna civakî û aborî dişkînin digire. Ew îstismarkirina pîşesazî ya li ser qazanc û reqabetê red dike. Ji bo peydakirina pêdiviyên civakî ekolojîk pêş dixe û hilberîna ku ne li ser hevsengiya ekolojîk be red dike. Hilberîna primitive ya neftê ji bo hewcedariyên herêmî û vexwarinê dibe sedema qirêjiya ax, av û xeterek cidî li ser tenduristiya gel çêdike, lewra ji bo ewlebûnê piştgirîya navneteweyî hewce ye.

15- Karê herî girîng avakirina zîhniyetê ye, berpirsyariya me ya civakî ew e ku ji akademiyan heta perwerdehiya resen di her qadê de hişmendiya ekolojîk pêş bixin û di vî warî de hemû mufredatên perwerdeyê amade bikin.

16- Tirkiye avê li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke çek bikar tîne û bi awayekî sîstematîk qutkirina avê ferz dike. Gihîştina ava vexwarinê û sektora çandiniyê yek ji mezintirîn qeyranên mirovahî û ekolojîk ye. Divê kampanyayên navneteweyî yên li dijî vê polîtîkayê bên zêdekirin û berfirehkirin. Çandina zeviyên berhemdar ên hişkesalî, ji nû ve çandina daristanan, rêbazên berhevkirina avê, û pergala avdanê ya jîngehê hatine pejirandin.

17- Bendav û Santralên Hîdroelektrîk (HES) jiyana mirovên li kêleka çeman dijîn û çand û xwezaya ku bi hezaran sal in li wir pêşketiye, xera dike.18- Vejandina (başkirina) daristan û zozanên li derveyî bajaran û girêdana wan bi hev re. Herwiha di rêjeya barîna baranê de ku ji ber krîza avhewayê kêm bûne, dikare hin zêdebûnek çêbibe.

19- Ji bo pêşxistina çandiniya ekolojîk û xwezayî ya li dijî koçberî/ji cîhûwarkirin û wêrankirina aborî ya li herêmên gundewarî divê xebatên fîzîbîlîte bên kirin.

20- Cûreyên nebat û heywanên herêmî/xwezayî yên ku li hember guherîna hawîrdorê berxwedêr in, divê werin tercîh kirin. Divê li hemû deveran navendên parastina cihêrengiya biyolojîk û tovên herêmî bên avakirin û weke herêmeke stratejîk bên birêxistinkirin.


21- Modelên hilberîna çandinî û heywanan ên piçûk ên dostê xwezayê têne parastin û piştgirî kirin. Kooperatîf bi taybetî tên destekkirin û weke hêmanên bingehîn ên vê pêvajoyê cihê xwe di koman de digirin.




# Bi têkoşîn û berxwedanê wê Rêber APO azad bibe

**Parêzera Rêber Abdullah Ocalan, ya endama Komeleya Asrin Razîye Ozturk,destnîşan kir ku, ti mafên asayî yên Rêber Apo nayên bicihanîn û cîhan û sazîyên peywendîdar bê deng dimînin. Her wiha Raziye Ozturk diyar kir ku tevî hemû hewldanên ji bo eşkerekirina rewşa Rêber Apo, lê heyanî neha tu agahî girêdayî rewşa Rêber Apo nehatine bi dest xistin.**

**Argêş Gewda**





25’ê Adara 2021an ve tecrîdeke giran li ser Rêber Abdullah Ocalan û Omer Hayrî Konar, Hamîlî Yildirim û Veysî Aktaş tê meşandin. Girêdayî rewşa Rêber Apo û tecrîda giran ya ku li hemberî wî tê meşandin, parêzer Raziye Ozturk bersiva pirsên rojnameya me da û naveroka hevpeyvînê wiha ye.

**Sedem çiye ku tecrîdeke giran li ser Rêber Apo tê meşandin?**

weke tê zanîn, ji alîyê dewleta tirkîyê ve bi cezayê heta hetayê yê girankirî li ser Rêber Apo hatîye birîn. Tê wateya ku mirovek heta jîyan bike li zîndanê bimîne. Gorî rêgez û zagonên dewleta tirk ya dagirker bi cihekê tene serê xwe dimîne, gor girtîyên dî hevdîtînên malbatê, çalakîyên civakî, hevdîtinên telefonê li gor girtîyên di astekê kêmtir deye. Lê dîroka 18’ê Adara 2014 an de dosya 2. mîn ya Rêber Apo Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewropa (DMME) ev bîryarên derheqê Rêber Apo da tên meşandin, weke zext û nêzîkatîyên derveyê hiqûqê nirxand. Ev biryar li gorê zagonên DDME binpêkirine û DDME gor zagonên heyî derheqê komara tirkîyê de biryar girtbû û daxwaz kir ku ev zagonên heyî turkîye derheqê Rêber Abdullah Ocalan da bên guhertin. Lê komara tirkîyê ev biryar jî guhdar nekir û komîteyên wezîra gorî vê biryarê ne meşiya berovajî tecrîd girantir kir.

**Hûn nêzîkatîyên (CPT)ê di derbarê Rêber Apo de çawe dinirxînin?**

Sibata 1999’an heya roja me ya îro di alîyên sazîyên navnetewî û xwecihî ve heya niha çi serlidan ji bona Îmralî nehatîye kirin. Erka CPT yê, serlêdana Îmralîyê bike, lê CPT’ê ev erka ku dikeve ser milê wê pêk neanî. Heya niha pêşketinek erênî çênebûye, ev jî serlêdana CPT’ê ya 22’ê Îlona 2022 bû. Ev serlêdan, ji ber piştî axaftina telefonê ya Rêber Apo gel birayê xwe Mihemed Ocalan kirî ya dîroka 25’ê Adara 2021’an ya dawî bû, girîngîyek xwe hebû,. Ev helwest û nêzîkatîyên CPT nayê qebûl kirin û çi hincetên vê rewşê tine ne. Ev dide xuyakirin ku CPT’ê û dewleta tirkîyê mîna hevkarên hev tevdigerin. CPT’ê jî li gorî rêgez û zagonên navnetewî tevnagere.

**Di kesayeta Rêbr Apo de qirkirina gelê Kurd tê meşandin?**

Dîlgirtîyên ku di zindanên dewleta tirkîyê de tên girtin ji bona şermezarkirina tecrîda li ser Rêber Abdullah ocalan tê meşandin, dîroka 27’ê Mijdara 2023’an girevên birçîbûnê dan destpêkirin û ev 130 rojin di çalakiyêdene û biryardarîyek mezin tê berdewam kirin. Ji bona bal bikşînin ser tecrîdê gireva birçîbûnê dawî kirin, û derbasê qonaxa duyemin bûn, ew jî di çarçoveya hevdîtina malbatê, telefon parêzer bayqot kirin. Tê zanîn ev girtî jî rewşeke pir zehmet dijîn, lê ruxmê vê jî gavekê şûnde navêtên. Mafên wan jî pir sînordarin, lê dest bi vê çalakîyê kirin. Wek herdem jî berteka herî mezin ji bo tecrîda li ser Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan û girtîyên din tê meşandin. Wan mirovan ji ber sedemekê ji rêzê mafê azadîya xwe winda ne kirin. Encama dîlgirtina wan ser bingeha mafê azadîya gelekê xwestin û ser wî bingehê têkoşîn kirin. Ev biryardarî û vîna gel wan heye û tevî hemû zextên tên meşandin jî biryardarîyek mezin, bertek û çalakîyên xwe dimeşînin û xwedî Rêbertî û hevalên xwe derdikevin. Di kesayeta Rêber Apo de qirkirina gelê Kurd tê meşandin. Ji bona vê yekê bangawazîya me ji bo malbatên girtiyan, gelê kurd û hemû mirovên aşîtîxwaz û demokrat, ew e, ku têkoşîna xwe mezintir bikin û piştgiriyê bidin zarokên xwe yên di girtîgihên Tirkiyê û Kurdistanê de. Her wiha pêwîste ku kar û xebateke bê sînor were meşandin, ji bona ku demldest ev zext û tecrîda ser Rêbertî dawî bibe û rêber Apo fîzîkî azad bibe.

# 87’yemîn salvegera Komkujiya Dêrsimê

**Navenda Nûçeyan**



Dewleta tirk 4’ê Gulanê 1937’an de bi biryarnameya lijneya wezîran a meclisê, li Dêrsimê dest bi komkujiya gelê kurd kir. Tevî ku bi dehan sal di ser komkujiyê re desrbas bûne jî, lê polîtîkayên qirkirin û asîmîlasyonê yên li dijî gelê Kurd di roja me ya îro de jî berdewam e.

Komkujiya Dêrsimê di dîroka nêz a Kurdistanê de yek ji wan komkujiyan ku bi dehhezaran kurd hatin qetilkirin, sirgûnkirin û asîmîlekirin. Tevî ku bi dehan sal di ser komkujiyê re desrbas bûne jî, bandora komkujiyê roja me ya îro berdewam e.

Li gorî daxuyaniyên fermî 16 hezar lê, li gorî gelê Dêrsimê yên bûne şahidên komkujiyê, herî kêm 70 hezar kurdên dêrsimî hatine qetilkirin. Gelek belge hene ku şahidiya vê qetlîamê dikin. Bi dehhezaran jin, zarok, kal û pîr bi gazên kîmyewî, bombebaranan û bi gelek awayên cur bi cur ên hovane li gund, şikeft, çeman hatin qetilkirin.

Ji ber kurdbûn û elewîtiyê, Dêrsim di çavê dewletê de keleha dawî ya kurdan a berxwedêr bû ku diviya destwerdan lê bihata kirin û ji holê bihata rakirin. Dewleta tirk tenê bi komkujiyê nema, piştî komkujiyê bi dehhezaran kurdên Dêrsimê ji warê xwe hatin dûrxistin. Ji bo wan asîmîle bikin bi hezaran keç û xortên dêrsimî di çerxa xedar a asîmîlasyonê de hatin helandin. Dewletê bi vê komkujiyê xwest Dêrsimê ji kurdîtî û elewîtiyê safî bike.

**‘Roja Reş’**

Welatiyên Dersîmê di 4’ê Gualan 2010’an de roja destpêkê ya komkujiyê wek “Roza Şiyaye” ango “Roja Reş” ragihand. Nûner û pêşengên rêxistinên Dêrsimê ji 2010’an roja 4’ê Gulanê qurnefîl bi çemê Mûnzûrê re berdidin û bi vî awayî kesên di komkujiyê de hatine kuştin bi bîr tînin. Her wiha ji bo bîranîna wan luqme belav dikin.

Her wiha girêdayî kumkujiya Dêrsimê konseya Rêveber a KNK’ê bi wesîleya salvegera Komkujiya Dersimê daxuyaniyek da û got: “Divê em têkoşîna xwe sist û lewaz nekin. Divê hesabê jenosîda Dêrsimê ji dijmin were pirsîn.”

Konseya Rêveber a Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) bi wesîleya salvegera Terteleya Dêrsimê ku 4’ê Gulana 1937’an bi biryara fermî ya dewletê hate kirin, daxuyaniyek nivîskî weşand.

**Daxuyaniya KNK’ê bi vî rengî ye:**

“Berî 87 salan, ji heft heyvî heta 70 salî gelê Kurd li Dersimê hate qirkirin. Komkujîyeke dilsoj, tenkîleke wêranker bi serê Dersim û Dersimiyan hate anîn. 4’ê Gulana 1937’an bi biryara fermî ya dewlet û hikûmeta Tirk, êrîşeke mezin a leşkerî bi armanca ji navbirina xelkê Dersimê hate kirin. Dewlet û hukûmeta Tirk bi kîn û nefreteke tolhildanî, ji erd û esmanan êrişî Dêrsimê kir. Bi hezaran Dêrsimî kuştin, hind jî birîndar kirin û bi hezaran jî bi darê zorê dane koçkirin û bi rê ve telifandin. Qirkirineke, jenosîdeke fermî bi biryara dewlet û hukûmetê, bi belge hate kirin. Ev fermana qirkirina hemû xelkê Dêrsimê bû. Ya ku dewlet û hukûmeta Tirk bi serê gelê Kurd li Dêrsimê anî çi dewletan bi serê dijminên xwe yên herî dijwar jî ne anîne. Ji xeynî komkujî, birîndarî û koçeke malwêranî, navê Dêrsimê jî bi qanûneke taybetî hate guhertin û kirin Tuncelî. Ew biryara komkujiyê, ew ferman, ew polîtîka, ew tertele, îro jî berdewam e. Dilê Kurdan ji ber wê jenosîda mezin bi kul e û ti caran ji bîr nakin û divê ji bîr jî nekin. Kurd divê hem wê kiryarê hem jî kirdarên wê bûyerê ji bîr nekin, di hiş û bîrên xwe da adeta bikolin ku çu caran jê neçe.

KNK di 4’ê Gulanê de vê jenosîda li Dersimê bi serê xelkê me hatiye anîn, piştî 87 salan jî bi hemû hêza xwe ve careke din şermezar dike. Berpirsiyarên dewlet û hukûmeta xwînxwar çi dibêjin, polîtîka giştî çi encam bide ferq nake û ev hovîtîya li ser gelê me hatiye kirin, rûpelekî reş ê dîroka bi xwîn a dewlet û hukûmeta Tirk e. Di her bîranîna van rojên xembar û dilsoj de divê xelkê me, rêber, pêşeng û têkoşerên bizava neteweyî û welatî, hem hafizaya xwe ron û geş bigirin hem jî di doza hesab pirsîna ji dijmin de bi biryar bin, têkoşîna xwe sist û lawaz nekin.

Hesaba jenosîda Dersimê divêt ji dijmin bête pirsîn. Jenosîda Dersimê nayê ji bîr kirin, divêt neyê ji bîr kirin.”

# Girînge nêzîkatiya Rêber Apo ya li ol û baweriyan baş bê fêhmkirin...(1)

Heta ku nêzîkatiya Rêber Apo ya ji ol û baweriyê re neyê fêmkirin, Konfederalîzma Demokratîk a Rojhilata Navîn nayê avakirin.

Nêzîkatiya hêzên welatparêz ên demokratîk û tevgerên sosyalîst a Rojhilata Navîn di sedsala 20'an de li hemberî ol, teng bû. Hîna jî gelek tevgeran ev yek derbas nekirine. Tevgerên sosyalîst ji ber vê nêzîkatiyê ketin nava tengasiyên pir cidî. Tevgerên şoreşger li Rojhilata Navîn ev nebesî derbas nekirin û nebûn civakî. Bandoreke girîng a vê nebesiyê heye. Rêber Apo ji roja destpêkê û vir ve, ev nêzîkatiya kêm û şaş ferq kir û ketiye nava lêgerîneke cuda. Rêbertî ev tengasiya tevgerên çep a di pêvajoya têkoşînê de hîn baştir dît û analîz kir ku pirsgirêkên civakî û siyasî ji ber bikaranîna ol a ji aliyê desthilatdaran ve ye. Di encamê de bi nirxandinên ku kirine, xet û nêzîkatiyeke nû derxistiye holê. Ev nêzîkatiya Rêbertî, ji bo pirsgirêkeke pir girîng a tevgera sosyalîst bûye çareserî. Rêbertiya me nêzîkatiya teng a tevgerên çep a li hemberî ol, di dawiya 1980'an di nirxandineke xwe de bi vî rengî rexne kiribû; "Di rastiya ol de, di bin navê komunîzmê de nêzîkatiya înkarê qasî di giştî de bi taybetî bandoreke pir xeter li ser gelên Rojhilata Navîn çêkiriye. Em diyar bikin ku ev nêzîkatî bûye sedem ku ji gel razber bibe û bi vî rengî jî paşverûtî têra xwe xurt bibe. Heta mirov dikare bibêje ku di rastiya ol de nêzîkatiya înkarê, di wateya pêkanîna hişk a materyalîzma diyalektîk de ye û yek ji sedemên herî girîng a pêşneketina şoreşên Rojhilata Navîn e."

Eger mirov bipirse ku cudahiya teorîk û bîrdozî ya Rêber Apo ji rêberên din ên sosyalîst di kîjan mijaran de derketiye holê û di kîjan nuqteyan de bandor li ser sosyalîzma demokratîk kiriye, bersiva yekem a ji vê re bê dayîn jineolojî û zanista azadiya jinê, bersiva duyem jî ji bo çareseriya civaka exlaqî û polîtîk nêzîkatiya li hemberî ol û baweriyê ye.

Weke ku tê zanîn di nava çepa Rojhilata Navîn de, bi taybetî jî di nava çepa Tirk de yek ji pîvanên şoreşgeriyê ji ol dûrketin e, înkar kirine û biçûkxistina ol e. Niha em hîn baştir dibînin û fêm dikin ku ev asosyaliyek pir cidî ye, ji zanistê dûr e û nêzîkatiyeke apolîtîk e. Sosyalîzm bi îtîbara xwe ya cewherî tê wateya bîrdozî û zanista civakî. Lê belê zanyarên civakê, yanî yên ku ji xwe re sosyalîst dibêjin, qadeke nirxê ya ku di avakirina nasnameya civakî de bi qasî nirxên etnîkî û çînî rol lîstiye, kirine qadeke ji rêzê. Ev yek xusûseke welê ye ku divê mirov li ser bifikire û dersê jê werbigire. Rêber Apo ji salên destpêkê yên jiyana xwe ya têkoşînê û vir ve neketiye vê nexweşiya çepê. Her çendî ku ji nuqteyên perspektîfa materyalîzma dîrokî ya kevneşopiya sosyalîst bandor bibe jî, bi demê re ev yek jî derbas kirin.

Teorî û bîrdoziya Rêber Apo zimanê jiyana civakî ye. Hem jî ya her kêlî û her rojê. Nêrînên teorîk û bîrdozî yên Rêber Apo, ji bo pratîka jiyanê kilavuz e. Sedemê vê yê herî girîng jî dahûrandina mirovan e. Naskirin û fêmkirina mirovan û pêşniyarkirina rê û rêbazên ku ji pirsgirêkên mirovan re bibe çareserî ye. Hingî ku Rêberê Gelan mirovan çareser dike, xeta zanista civakê jî şêwe girt ku li gorî berê cuda û xweser e. Ev paradîgmaya ku navê paradîgmaya netewa demokratîk lê kiriye, di roja me de yekane tez, tespît û perspektîf e ku ji pirsgirêkên civakê re çareseriyê dihilberîne.

Weke ku tê zanîn rêbaza Rêbertiya me ya çareserkirina kesayetê, ji bo pêşxistina hest û zanista mirov û ji bo avakirina kesayeteke azad û bi îrade rêbazeke diyalektîkê ya ku xwedî encamên bê hempa ye. Rêber Apo bi gotina "Ez li Îmraliyê rojê xwe 40 caran xirab dikim û ji nû ve ava dikim" anî ziman ku bi vê rêbazê dijî. Ev taybetmendiyeke pêşengitiyê ya Rêber Apo ye. Mîna ku di realîteya Kurd û kesayeta jinê de hatiye îspatkirin, ev yek di roja me de jî rêbaza avakirina mirov e ku ji her derdê re bibe derman. Mirovên di roja me de di nava xwexapandineke mezin de ne; ji ber ku mirovên roja me xwe weke hebûneke bê hempa, xwe temam kirine, bê kêmasî ne, bê pirsgirêk in û her tiştê dizanin, dibînin. Ji ber vê nexweşiyê hema bibêje her kes mirovê li hemberî xwe tune dihesibîne. Em di demek wisa derexlaqî de derbas dibin ku her kes xwe bêhempa dihesibîne û di heman demê de ji aliyê kesek cuda ve jî tune tê hesibandin. Di serdemeke bi vî rengî de ji bo ku kes li dijî nefsê xwe şer bike û her roj xwe ji nû ve ava bike, pêdivî bi zanista civak û dîrokeke kûr heye. Dema ku mirov xwe ava dike malzemeya di destê wî/ê de



dîrok û civak e; sedemê ku em bal dikîşînin ser vê dîrok û civakê ew e ku Rêber Apo mîna rêber, fîlozof û zanyarên din nêzîkatiyê li hemberî ol raber nake. Ji ber ku dema kesayeteke desthilatdar tê hilweşandin û li şûna wê kesayeta netewa demokratîk tê avakirin, kesekî ku agahiya wî/ê ji tiştên diqewime nîne nikare nêzîkatiya şoreşgerî ya Rêber Apo ya ji ol re fêm bike; nikare bi ferasetên olî çanda demokratîk a dîrok û civakê bibîne û bi teslîmkirina heqê xwe nirx nade.

Rêber Apo di nirxandineke xwe ya beriya 1990'an de ev tişt diyar kiribû: "Ol qasî mirovahiyê kevne. Parçeyek e ku ji avabûna mirov qut nîne. Avabûna mirov avabûneke olî ye. Ti civak nîne ku ol nas nake. Di jiyana hemûyan de ol heye. … Divê di avakirina mirov de ol weke hêmanek e ku dest jê nayê berdan were nirxandin." Mirov dikare ji vê nirxandina Rêber Apo fêm bike ku Rêbertî di gelek qadan de xwedî nêrîneke zanista civakî û feraseta sosyalîst e ku ev nêrînên xwe bi navê Paradîgmaya Civakê ya Demokratîk, Ekolojîk û Azadîxwaziya Jinê pêşkêşî mirovahiyê kiriye.

Nêrînên Rêber Apo yên derbarê ol û baweriyê de, di pêvajoyên destpêkê de baş nehatine fêmkirin. Di nava refên PKK'ê de jî gelek kes hebûn ku bi gotina 'nêzîkatiyeke polîtîk e' ev nêrîn ji rêzê nirxandin. Hinekan jî ev analîz û tespît bi gotina "Kurd oldar in, li cem Kurdan ol gelek bandor e, Ocalan van tiştan dibêje da ku nehêle dewleta Tirk bi rêya ol Kurdan bixapîne" derbas kirin. Divê mirov diyar bike ku nêrînên Rêber Apo yên derbarê sê mijaran, ji aliyê hin Kurd û Tirkan ve weke ku bi nakok e nirxandine. Ya yekem nirxandinên wî yên derbarê netew û Kurdan, ya duyem nêrînên wî yên derbarê jinan û ya sêyem jî nirxandinên wî yên derbarê ol û baweriyê de ne. Weke ku tê zanîn hin netewperest û çepên Kurd bi gotina 'PKK ji Kurdan zêdetir ji bo Tirk û Ereban têdikoşe' rexne dikin û sûcdar dikin. Netewperestên Tirk û hinek çepgirên Kurd jî ji bo PKK'ê dibêjin netewperest, heta sûcdariya nîjadperestên Kurd lê dike. Yên ku xeta jinê ya Rêbertî û nêzîkatiya wî ya li hemberî jinê mîna nêzîkatiyeke polîtîk nirxandin û îftîra avêtin Rêbertî, gelek bûn. Di nava jinan de jî yên ku şaş fêm dikin û şaş nêz dibin, derketin. Di qada ol û baweriyê de jî nêzîkatiyeke heman heye. Ji hinek kesên ku xwe weke zanyar, sosyalîst, laîk û sekuler pênase dikin, ji PKK'ê re dibêjin "rêxistineke oldar". Yên ku xwe weke oldar pênase dikin jî, ji PKK'ê re dibêjin "ji dervey ol e". Divê were fêmkirin ku çima xeta Rêbertî têkildarî van mijaran bi nêrînên dijberî hev tê nirxandin. Hin şablon hene ku di mejiyê mêrekî kevneşopîparêz û jineke kole de, di serê çepekî dogmatîk ê klasîk û kesekî netewperest û oldar de çêbûne. Li ser zimanê wan jî jiberkirin heye. Evane nikarin ji qalibê ku wan şêwe dayiyê derbikevin. Eger derkevin wê mîna ku guneh kirine, lê bên. Pêşdarizandina kesên xwedî vê ferasetê, tirsa wan a ji şoreşgeran û dijminahiya wan a ji bîrdoziya demokratîk re, ji her cure fikrê xurttir e.



## Xeyala Hevdîtina R.Erdogan a Biden, beravê çû!

**Ahmet Aktaş**

Çar salin ku R.Erdogan li benda Biden bû, ji bo vexwendina Koşka Spî. Li goreyî saloxên dawî, ev hevdîtin pêknayê.

Min di gotara xwe ya hefteya derbasbûyî de gotibû, gelek nîşane hene ku dibe Biden, R.Erdogan ji rojeva xwe derxistibe û rê bide CHPê. Yek ji van nîşanan jî ev e: Hema bêyî ku demê dirêj bike, daxwaza Serokê CHPê Ozgur Ozer pejirand û di 2.5.224 de li hev rûniştin.

Di dema nivîsandina vê gotarê de, hîn daxwuyaniyên herdû aliyan jî nehatibûn weşandin. Belê mirov dikare li ser hinek şîroveyan û awir û tevgerên wan, çend gotina bêje.

Heta niha R.Erdogan, ji bilî carekê li gel Baykal û Kiliçdaroglu, bi taybetî li gel CHP'ê û hinek partiyên dijberên xwe, ji hevdîtinên wisa re ne digot erê.

Bêgûman sedema bingehîn a nerazîbûna wî; ji ber ku heta niha di hemû hilbijartinan de serkeftîbû û ji bo bi giştî partiyên din ji xwe re hevseng/hevta nebîne û ji bo biçûkxistina van partiyên dijberî xwe bû.

Lê vê carê di hilbijartinên xwecihî de derbeyek mezin xwar û daket asta partiya duda. CHP'ê bû partiya yekê, YR bû ya sisya, DEM PARTI bû partiya çara û hwd.

Bi vê şkestinxwarina hilbijartinên dawî re, radeya derûnî û coşa nava partiya R.Erdogan pir daket jêr.

Jê veqetandin her roj zêdetir bû.

Ji bo pêşiyê li vê bêmoraliyê û hilweşandinê bigre, zimanê axaftinên xwe guherî, hinek nermtir daxwiyanî da û bi kurtayî got "ez ê ji encamên hilbijartinan re rêzdar bim û hwd."

! Her wiha her tim ji dijberiya gelê Kurd daneket jêr û gefxuriyên xwe dewam kir.

Pejirandin û pêkanîna hevdîtina li gel Ozgur Ozel, yek ji encamê wê hilwesta wî ya nuh a xwedêgiravî "nerim" bû.

Carên beriya niha ji bo hevdîdinê, K.Kiliçdaroglu li gel D.Bahçeli çûbûn seraya R.Erdogan. Lê vê carê O.Ozel neçû serayê, li navenda AKPê hevdîtin pêkanîn.

Tê gotin O.Ozel, ji rêza rûniştina niha jî ne razîbûna xwe diyar kiriye û R.Erdogan, ji bo vê şaşişa xwe sererast bike gotiye, "em ê vê carê, werin seredana we li navenda CHP'ê"!

Ji vê helwestê jî tê dîtin ku R.Erdogan li lawazbûna xwe mikur tê û êdî ji bo desthilatiya xwe ji dest bernede dikare serî li her cûrê helwestan(erênî(!)-neyînî) bide!

Li aliyê din di heman vê roja hevdîtinê de, Can ATAKLI(Flash TV), li ser gotarên nivîskar Abdulkadir Selvi hinek agahiyên balkêş dida. Digot , "dibêjin wê di demek nêz de Osman KAVALA, hinek girtiyên din ên doza Gezi Parkê û hwd.gelek kes ew ê werin berdan", "Her wiha hatiye gotin ku Abdullah Ocalan jî wê di roja 27'ê Gulana 2024'de, ji zîndana Imrali were derxistin, wê derbasî 'girtîgeha malê' bibe"! Li Rojhilata Navîn, senaryoyek di asta konjoktura cîhanî de tê meşandin. Dewleta Tirk û Tevgera Gelê Kurdistanê berendamên aktoriyê ne, bê guman rolên wan ji hev cuda ne. Di vê senaryoyê de Tevgera Azadiyê aktorê Rêya Sisya ye, lê Dewleta Tirk û Îran wê aktorên kîjan rêyê bin pir ne aşkere ye. Hişyariya xurt divê!



# 'Wê azadiya Rêber Apo di kongireyên astên bilind yên cîhanî de were nîqaşkirin'


Endamê Însiyatîfa Sûrî a ji bo azadiya Rêber Apo Zekî Hesen da zanîn ku wê di qonaxa 2'yem ji Pêngava Azadiya Rêber Apo gavên cidî di kongire û civînên astên bilind de ji bo azadiya Rêber Apo were parvekirin.

**Reşo Mihemed/Qamişlo**

Di 4'ê Nîsanê de qonaxa duyem ji Pêngava Azadiya Rêber Apo ya fîzîkî li ser asta cîhanê hate destpêkirin, têkildarî vê mijarê jî Endamê Însiyatîfa Sûrî a ji bo azadiya Rêber Apo Zekî Hesen bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn jî wiha bû:

**Pêngava Azadiya Rêber Apo di asta xwe ya duyem de ye, girêdayî vê yekê jî wê çi di dema pêş de were kirin?**

Bê guman armanc û hedefa Pêngava Azadiya Rêber Apo ya fîzîkî, şikandina tecrîda giran û azadkirina Rêber Abdullah Ocelan e. Me ne tenê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ev pêngav dabû destpêkirin, lê belê li ser asta cîhanê tevahî bû. Qonaxa yekem ji pêngavê zexteke mezin ji aliyê gelê kurd û tevahiya gelên cîhanê ve hat kirin ji bo diyarkirina tecrîda li ser Rêbertî. Her wiha eşkerekirina îşkenceya ku dewleta Tirk a dagirker di şexsê Rêber Apo de û kiryarên li ser



gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dike. Em dikarin bibêjin ku di qonaxa yekem de bi riya çalakiyên ku hatine li darxistin ev yek kete rojeva cîhanî de û bala cîhanê bi tevahî hat kişandin. Di dema niha de Pêngava Azadiya Rêber Apo ketiye qonaxa duyem. Di dema pêş de ji çarçoveya pêngavê wê gavên cidî ji bo azadiya Rêber Apo li ser asta cîhanê bi giştî werin avêtin. Di serî de wê asta danûstandinên diblomasî di civînên bilind yên serokên dewletên cîhanê de werin xurtkirin. Ji ber ku mijara tecrîdkirin û dîlgirtina Rêber Apo di Rojhilata Navîn de yek ji pirsgirêkên herî mezin e. Lewma jî wê hewldanên ji bo lidarxistina kongir û civînên bilind ji bo vê yekê werin lidarxistin û peyman jî ji bo azadiya Rêber Apo werin îmzekirin. Di heman demê de jî wê siyasetmedarên Tirk werin neçarkirina ku ji bo bicihkirina xwesteka gelên azadîxwaz a ku doza azadiya Rêber Apo dike.

**Bêdengbûna CPT ji tecrîda giran a li ser Rêber Apo tê çi wateyê bi taybet dema ku piştî erdheja ku li derdora Îmraliyê çêbû, CPT serdana Tirkiyê kir, lê derbasî Îmraliyê nebû, ev tê çi wateyê?**

Gelek pirsyarî û xalên pirsnîşanê em di derbarê mekanîzma karê Saziya Pêşîgirtina Îşkenceya li ser Mirovan CPT de ji bo tecrîda li ser Rêber Apo dibînin. Ji ber ku ew jî dikeve bin bandora siyaseta dewleta Tirk a faşist û komplogeran. Di vê dema ku tê xwestin de ku pirsgirêkên siyasî bandorê li mekanîzma kar û erkê CPT newe kirin, lê hevkariya wê bi dewleta Tirk re tê misogerkirin. Wekî em dizanin Rêber Apo di bin tecrîdeke giran de ye û destûra hevdîtina parêzer, malbat rêxistinên civakî nayê dayîn. CPT weke saziyeke eleqedar e bi kesên ku di bin îşkenceyê de ne tu agahiyan di derbarê rewşa Rêber Apo de eşkere nake. Di dema dawî de jî piştî ku erdhej li derdora Îmraliyê rûda, CPT derbasî Îmraliyê nebû, ev yek jî cihê pirsyariyê ye. Çima CPT di mijara tecrîdkirina Rêber Apo xwe bêdeng dike, herwiha serdana Îmraliyê nekir û di heman demê de daxuyaniyekê ji bo diyarikirina rewşa Rêbertî neda. Lewma em CPT weke sûcdareke bingehîn destnîşan dikin û bang dikin ku bila bi erkê xwe yê di warê diyarkirina rewşa Rêbertî de rabe.

**Asta berxwedanî û vîna gelê kurd û tevahiya gelên azadîxwaz niha çiqasî dikare bandorê li sazî û rêxistinên ewrupî û cîhanî bike ku azadiya Rêber Apo pêk were?**

Di roja îro de li ser asta cîhanê pêngaveke mezin ji bo azadiya Rêber Apo di qonaxa xwe ya duyem de didome, gelê kurd û yên cîhanê tev ji bo azadiya Rêber Apo têkoşîneke bêhempa dikin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û dewletên cîhanê bi azadiya fîzîkî ya Rêbertî bang tê kirin. Gelên Bakur, Rojhilatê Sûriyê û şêweyê jiyana hevbeş a di navbera pêkhateyên wê, herwiha Netewa Demokratîk hetanî azadiya gelan ji ramanên Rêber Apo ne. Gelên cîhanê jî dozdarên azadiyê ne û tiştekî hevbeş di navbera ramanên wan û ramanên gelên Bakur, Rojhilatê Sûriyê de hene. Gelên cîhanê ji ber ku baş dizanin azadiya fîzîkî ya Rêber Apo riya çareserkirina pirsgirêkên tevahiya gelên bindest e. Her wiha fikr û felsefeya Rêber Apo sembola azadiyê ye. Bingeha berxwedanî û vîna gelên ku tevlî pêngava azadiyê bûne ji fikir û felsefeya Rêber Apo werdigre. Lewma jî wê ev vîn û berxwedana gelê kurd û hemû gelên ku evîndarên azadiyê ne roleke pir mezin li raya giştî bikin ji bo pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Apo. Baweriya me bi vê vîn û berxwedaniyê heye û azadiya Rêbertî tiştekî tekez e.

# 'Bi berxwedana gelê kurd wê faşîzma Erdogan hilweşe'

**Vîndar Roj/ Şehba**

**Gelê kurd li Bakur û Rojhilatê Sûriyê êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li dijî Qadên Berxwdanê, herwiha serdana Erdogan ji Bexda û Hewlêrê re û peymanên ku ji bo qirkirina gelê kurd hatine îmzekirin, bi tundî şermezar kir û got, "Bi berxwedana gelê kurd û Tevgera azadiyê wê desthilatdarî û faşîzma Erdogan hilweşe."**

Li dijî hebûn û destkeftiyên gelê kurd, kêlî bi kêlî dijmin plan û siyastên qirêj dide meşandin. Di heman çarçoveyê de wekî her car PDK'ê destekê dide dijmin û li ser xwîna gelê kurd peymanan bi dagirkeran re îmze dike. PDK'a mala Berzanî tevahiya sînorên xiyanetê jî derbas dike. Her çiqas PDK ê di dîrokê de ev yek kiriye jî lê bi pêşwazîkirina serokê terorê Erdoxan li ser xaka Kurdistanê ya ku bi sala ye Eroxan li ser vê xakê pilan û êrîş kirine hemû sînorên bê rêzî û îxanetê derbas kirin. bê guman ev hevdîtin di bin gelek lihevkirin û gerandina pilanan de hate pêk anîn. Di serî de tavahî bendên ku hatine erêkirin xizmeta berjewendiyên gelê Kurd nakin. Di nava van hevdîtinan de bi erêkirina PDK ê bi tayebet hebûna Tevgera Azadiya Kurdistan hatiye nîqaş kirin û li ser Tevgera Azadiyê bendên taybet hatine îmzekirin. Ev yek dide tekezkirin ku PDK ê di êrîşên li ser Gerîlayan de destkdarê yekemîn e. Bi hemwextiya van lihevkirinan re dagirkeriya Tirkiyê êrîşên xwe yên li ser herêmên Parastinê yên Medayê dan destpêkirin, bê guman ev yek jêdara xwe ji wan lihevkirina digire.

Têkildarî xiyaneta PDK'ê û êrîşên dagirkeriya Tirkiyê yên li ser Gerîlayên Azadiyê, koçberên Efrînê li herêma Şehbayê Hêvî Silêman û Bavê Şîlan ji rojnameya me re axivîn.

### Binkeftina Erdogan û pilanên nû

Hêvî di axaftina xwe de diyar kir ku desthilatdariya Erdogan hilweşiya ye û bi pilanên nû dixwaze xwe hilde ser piyan û wiha got: "Erdogan di salên dawiyê de hilweşînên gelek mezin di welatê xwe de jiyan dike. Ev yek jî ji destwerdan, êrîş û pilanên ku di welatên derdor re weke Sûriyê de pêşxistine. Aboriya Tirkiyê têkçûye û gelê Tirkiyê ev rewş qebûl nekiriye. Di heman demê de vê yekê bandora xwe li ser hebûna wî bandor kir, binkeftina wî di hilbijartinan de jî ev yek tekez kir. piştî van windahiyê mezin erdoxan careke din berê xwe da



hêvî silêman

pilanên nû. Vê carî bi Hikumeta Îraqê û hikumeta PDK ê re".

### Li ser hesabê Axa Kurdistan û gelê Kurd bazarkirin

Hêvî da zanîn ku pilan û lihevkirinên hatine pêşxistin li ser hesabê axa Kurdistanê û gelê Kurd e û wiha pê de çû: "Bi erêkirina li ser 24 xalên ku hatine eşkerekirin di navbera Hikumeta Îraqê, Hikumeta PDK ê bi Erdoxan re, hat diyar kirin ku piraniya madeyên li ser hatine li hevkirin nakevin xizmeta gelê Kurd û li ser hesabê axa Kurdistanê ya pîroz bazaran didin meşndin. Em vê yekê baş dizanin ku armanca Erdoxan ya yekemîn li ser hesabê gelê Kurd bazarkirine bi hikumeta PDK ê re pilanan ava bike, da ku têkoşîna gelê Kurd ya ku ji aliyê Tevgera Azadiya Kurdistan ve tê meşandin vala derbixin. Ji lewra di pendên eşkerekirî de hatiye diyar kirin ku wê bi Hikumeta Îraqê re şerê Partiya Kerkerên Kurdistan



bavê şîlan

bikin. bê guman ji bilî van madeyan gelek pilanên veşartî jî hene".

### Bi êrîşkirina Metîna re armanc diyar bû

Bavê Şîlan destnîşan kir ku bi hemwextiya hevdîtinan re herêmên Parastinê yên Medyayê hatin êrîşkirin û wiha got: "Encama siyaset û lihevkirinê ku hatine pêkanîn di şerê ku li ser herêmên Parastinê yên Medyayê de hate xuyakirin. Bi hemwextiya van hevdîtinan re Erdoxan dest bi şerê li hember gerîlayên Azadiyê li Metîna kir. her çi dibe û çi bidin xuya kirin jî armanca wî ya sereke tunekirina Tevgera Azadiyê li çiyayan e".

### Eşkerebûna sekna PDK ê li hember doza Kurd

Her wiha bavê Şîlan bal kişand ser sekna Hikumeta PDK ê û wiha domand: "Dijminê yekemîn ya tevgera azadiya Kurdistan mala berzaniye Hikumeta PDK ê di vir de temsîlkarê yekemîn yê dijminahiyê da nîşan dan. Bi dijminê Kurdan yê hezar salan re lihevkirin tê wateya heqaaret û sînorên îxanetê jî derbas kiriye. Mala Berzanî bi vê yekê re îxanetê li doza serxwebûna Kurdistanê û li gelê Kurd kirin. êdî pir eşkere ev seekin hat nîşandan".

### `Serdema Erdoxan bi destê Tevgera Azadiya Kurdistan hilweşiya`

Bavê Şîlan tekez kir ku wê ne lihevkirin û ne jî êrîşên dijmin îradeya gel û ya tevgera azadiya Kurdistan hilweşînin û wiha bi dawî kir: "Di oxira têkoşîna Azadiya Kurdistan de bedel û windahiyên pîroz hatin dayîn. Rêber Abdullah Ocalan bi destpêkirina vê şoreşê re îhtîmala têkçûn û başde vegerandin ji holê rakiri bû. Ji lewra zêdetirî 5o salî ye ev têkoşîn bi berxwedanî û serkeftinên gelek mezin tê berdewam kirin. Dîroka faşîzma Tirkiyê di şexsê Erdoxan de bi xwîna Kurdan hatiye naskirin. hilweşîna serdema Erdoxan jî bi destê Tevgera Azadiyê û îradeya Gelê Kurd diyarbû, piştî ewqas salên tijî têkoşîn û berxwedanî wê ne lihevkirin û ne jî êrîşên dijmin îradeya me bişkîne".